# HER ÇIQAS R'ÊJÎMA AKP/MHP HEWL DIDE, KU PÊVAJOYA AŞTÎYÊ Û CIVAKA DÊMOKRATÎK TÊKBIBE, LÊ YEK E, EW DIMEŞE Û BI XWE R'A R'ASTÎYÊN DÎROKÎ DERDIXE HOLÊ! ...

*"Aş bi xiyalekê, aşvan bi xiyalekê!"*
Gotina pêşîyan

**Ezîz ê Cewo**

Van demên dawîyê di derbarê helwest û hewlên r'ayedarên r'êjîma Tirkîyayê ên dijî vê pêvajoya dîrokî ya *'Aştîyê û civaka dêmokratîk'* û *R'ojavayê K'urdistanê* da hinek agahî derdik'evin holê, yên ku di nava civakê da net'avetîyê hişyar dikin, û bi xwe r'a pirs û nirxandinên cuda tînin, û ew jî pêdivîya xwe bi şirove û r'avekirinan hene …

Bi r'astî jî, bûyer wisa lezgîn li pey hev tên û xwe li hev diguhêr'in, ku mirov pêr'a jî nagihîne, wan hemûyan binirxîne û wat'edar bike.

Lê, dîsa jî, emê hewl bidin …!

Di gotara xwe ya *"Pêvajoya aştîyê û civaka dêmokratîk, helwesta r'êjîma AKP/MHP û r'astîyên dîrokî"* da me gotibû, ku, *wek ku tê xuyan, têk'oşînek a ç'ekdarî a 41 salan pêwîst bû, ji bo ku serokk'omarê T'irkîyayê navê gelê k'urd li r'ex navên gelên t'irk û ereb bîne zimên û behsa biratîya wan bike (balk'êş e, çima t'enê ya van hersê gelan, lê gelên dinê, yên çerkez, t'ûrkmên, ermenî, asorî, yewnanî... li k'u man?! – Helbet, ev jî bi serê xwe pirsek e!), û wisa jî li xwe mukur' bê, ku ji sala 1984-an va di welatê wan da hukumet hatine û çûne, û her yekê ji wan jî gotye, ku ewê PKK têk bibin, lê ji wan r'a li hev nehatye!...*

Ku, *hema li vira jî bersîva wê pirsê dertê holê, k'a çima jinişkêva evê r'êjîma sûck'ar a AKP/MHP bi devê Dewlet Baxçelî behsa axavtina bir'êz Ocalan di Meclîsa T'irkîyayê da kir? ...*

Ku *evê jî, ew bi neç'arî dibêje, lewra ku, vekirî tê xuyan, ku ew û hevpeymanîyên wî yên hukumetê heya dawîyê hewl didin, çiqas ji destê wan tê, lîstikên xwe yên siyasî bidomînin û hewl didin, ku pêvavajoyê wek xwe berovajî bikin, an jî têkbibin. Ku ew tiştên ku bi zarê wan tê gotin, tiştekî neç'arî ye, ji ber ku konyûktûrên cîhanê, bi t'aybet jî, yên R'ojhilata navîn, hatine guhar'tin, û ew baş têdigihîjin, k'a çi ji wan tê hêvîkirin (r'asttir dibe, mirov bibêje – tê xwestin!). Lêbelê, Erdoxan dê ne Erdoxan be, eger her tiştî wisa hêsan pêk bîne, wek ku ji wî tê xwestin. Ewê lîstikên xwe bidomîne, ji bo ku bide xuyan, xwedêgiravî, bi xwe jî t'erfdarê pêvajoyê ye, lê di r'astîya xwe da dê her tiştî bike, ku ev pêvajo an neçe sêrî, an jî bê lêpovajîkirin û nivîşkan û nîvhero pêk bê. Û hemû gotin û gavên wî yên îro govenîya vê yekê didin*.[1]

Û Erdoxan fersendê ji destê xwe bernade, ku vekirî an sergirtî gefan li k'urdan bixwe. Axavtina wî ya vê dawîyê yek ji wan mînakan e. Ew dibêje, eger *"K'urd berê xwe bidin Şamê û Ankarayê, wê ser bik'evin!"*. – Ango, dixwaze ji k'urdan r'a bibêje – eger hûn careke dinê bextê xwe paşva r'adestî Şamê û Ankarayê nekin, hûnê sernek'evin, ku her t'enê ev herdu navend dikarin pirsên k'urdan ç'areser bikin (ango, wan t'eposerî û t'une bikin!).

Û wisa jî dibêje, ku di dîrokê da di navbera k'urd û t'irkan da şer' dernek'etine!...

A, li vira ye, ku pêşîyên me dê bigotana: *"Lo, bes e, hedê xwe bizanibe, û ji me r'a ç'îr'okên pîrê nebêje, me t'êra xwe "ç'aresrîyên" we dîtine!"*

Wek ku tê xuyan, ew hînhatine, di bin siloganên biratîya lêp (a sexte) da gelê me bikin xewa mirinê û t'une bikin! Lêbelê, k'urd êdî ne ên berê ne. Gelê me îro xwedî bîrdozîya net'ewî ye, ew r'êxistinkirî ye, xwedî hêz û t'evger e, û dê wisa hêsan nek'eve xefika wan.

Helbet, gotinên Erdoxan ên di wê derbarê da, ku di navbera gelên t'irk û k'urd da şer' derneketine, heya r'adeyekê nêzîkî r'astîyê ne, lewra ku ewana bi gotinên *"em hemû misul-*

---

[1] https://www.amidakurd.net/ku/tekst/P%C3%8AVAJOYA_A%C5%9ET%C3%8EY%C3%8A_%C3%9B_CIVAKA_D%C3%8AMIKRAT%C3%8EK

*man in, em birayên hev in!"* em kirine xwea mirinê û bi yekalî em t'unekirine – û me serî li ber wan hilnedaye, me berxwenedaye, em ji bo wan bûne *"berxên qurbanê"*, ewana em yekalî t'unekirine, lewra jî di nava me da şer' çênebûne!...

Lê dema ji nava me hinek derk'etine, û xwestine vê bêdadîya dîrokî, t'evkujîya gelê k'urd, wêranî û t'alana K'urdistanê r'awestînin, ewana ew di girêdana bi dewletên derva da gunehk'ar kirine, an ew têr'orîst navkirine, ji bo ku gelê sade ç'avtirsîyayî bikin û civaka navnet'ewî jî bixapînin û bixalifînin.

Û, em, wek net'ew, divê li xwe mukur' bên, ku ev yek heya demekê ji wan r'a li hev hatye. Lê her heya demekê!...

Lê îro êdî bi wan gotinên xwe yên kevn û xilmetbûyî ew p'ir' dereng mane, di emcama têk'oşîneke bêhemp'a ya demdirêj (a nîvsedsalekê!) êdî ew, ên ku doza mafên k'urdan dikin, ne hinek in, ew p'ir'anîya gelê k'urd in – bi dayîkên xwe yên aştîyê va, bi dot û lawên xwe yên leheng va, bi p'akr'ewanên xwe va, bi k'arker û gundîyên xwe va, bi r'ewşenbîr, hunermend û bîrewarên xwe va, bi siyasetmeder û dîplomatên xwe va û, ya sereke, bi R'êberîya xwe ya net'ewî va!

Piştî banga r'êberê gelê k'urd bir'êz Ocalan, kongrêya PKK a dîrokî (a XII) pêk hat, k'omek gêrîlayan bi sembolîk çalakîya ç'ekşewitandinê pêkanîn, lê, yek e, r'êjîma îroyîn a T'irkîyayê (klîka sûck'ar a Erdoxan/Baxçelî) wek xwe maye: ne di gotinên wan da, ne jî di k'arên wan da hîç guhar'tinek pêk nehatye – ew dîsa gotinên xwe yên berê dubare dikin, ên wek: *"... bêtêr'orkirina T'irkîyayê!"*, *"divê bên û bi ç'ekên xwe va xwe r'adest bikin!"*... – Mirov van gotinan dibihê û matma dibe.

Belê, r'ast e, di siyasetê da exlaq û wijdan nînin, lêbel, ewqas jî nebe!

Eger ew di pirsa *"... bêtêr'orkirina T'irkîyayê!"* da ferz dikin, wê demê divê têr'ora dewletê ya li hember gel bê r'awestandin, lewra ku di T'irkîyayê da her ç'avkanîyeke têr'orê heye, ew jî r'êjîm bi xwe ye! Û, eger ev r'êjîma têr'orsaz bê guhar'tin, ne ku t'enê T'irkîya, lê her weha, t'evahîya herêmê, heya t'evahîya cîhanê dê bêtêr'or bibe! An – na, bi vê r'êjîmê, bi vê heşmendî û têgihîştina vê klîka sûck'ar, tiştek dê neyê guhar'tin...

Bala xwe bidinê, Dewlet Baxçelîyê hevp'arê desthilata AKP/MHP bang dike, ku bila Ocalan bê û di meclîsê da biaxive. Û di wê bangê da soza mafê hêvîyê jî dide!... Lêbelê, ewqas dem bihurye, ewqas bûyer pêk hatine, PKK ewqas gav avîtine, lê r'ayedarên vê r'êjîmê, dîsa heman ç'îroka xwe dubare dikin.

Ê, wê demê ev bang, ev sozên wan li k'u man?

Bala xwe bidinê, ji bo ku pirsgirêka k'urdî bi aştî bê ç'reserkirin, PKK kongrêya xwe ya XII pêk anî, wek r'êxistin xwe betal kir, hêzên gêrîlayan di vê pêvajoyê da agirbest daxwîyandin, bi çalakîya ç'ekşewitandinê dan xuyan, ku ew amede ne, têk'oşîna ç'ekdarî r'awestînin û ji bo ç'areserîya mafên gelê k'urd bi r'êbazên aştî û dêmokrasîyê têk'oşîna xwe bidomînin, lê, yek e, r'êjîm êrîşên xwe yên ser hêzên gêrîla didomîne, ne bes e, ew gor'istanên p'akr'ewna hildewşîne û wêran dike, gefan li R'ojavayê K'urdistanê dixwe, amadek'arîyên êrîşên leşkerî dike, t'ecrîda li ser mîmarê pêvajoya aştîyê û civaka dêmokratîk – bir'êz Ocalan bi r'ngekî nû didomîne ...

Û r'ewşek a weha di nava civakê da dibe sedema tirs û fikaran, ku r'êjîm k'urdan dixapîne, ku ewê hîç gavekê jî neavêje...

Û mirov evê heya r'adeyekê (her heya r'adeyekê!) têdigihîje!

Helbet, klîka sûck'ar a AKP/MHP, û hevalbend û peyayên wan dê bi r'aê xwe hîç gavekê jî neavêjin, divê em xwe nexapînin, ev r'êjîm li ser bingeha r'êgezên cuda pêk hatye, eger ew anegorî vê pêvajoyê gavan biavêje, wê bê wat'eya mirina sîstêma wan a dijmirovî ya sûck'ar, lewra jî ewê heya dawîyê lîstikên xwe bidomînin, ewê her tiştî bikin, ku ev pêvajo neçe sêrî û wisa bikin, ku gunehk'arên wê têkçûnê jî *"ew bi xwe nînbin"*! Lewra jî ew êrîşên xwe yên li ser hêzên gêrîla didomînin, wek ku me berê jî gotibû, ew PKK baş nas dikin, ew dizanin, ku bi wan êrîşan dê ser nek'evin (û ji bo vê Erdoxan bi xwe jî li xwe mukur' hatye!), lê dê bikaribin hêzên gêrîla neç'arî şer'ekî mezin bikin, ji bo ku paşê bikin hewar û hêwarze, bibêjin – a, me digot!

Û, eger bê ber heşê hinekan, ku r'êjîma T'irkîyayê T'evgera R'izgarîxawaz dixapîne, ewê ji sedî sed şaş bin.

Helbet, armancek a wan a wisa hema di destpêkê da hebûye. Lê divê bê zanîn, ku dema bir'êz Ocalan di destpêkê da bang kirye, ewî baş dizanibûye, ku ev r'êjîm dê heya dawîyê berxwe bide, ku ewê ji bo ç'areserîyê hîç gavekê jî neavêje, lê ewî wisa jî dizanibûye, eger pêvajoyek a goftûgo û gengeşîyan di Meclîsê da, di nava beşên civakê yên cuda da (gelê sade, r'ewşenbîr, hunermend, siyasetmeder) û li ser asta navnet'ewî pêk bê, dê hewa siyasî bê guhar'tin, û civakê bi xwe doza guhar'tinan bike. Û di vê pirsê da hêza here dînamîk jî, civaka K'urdistanê ye – bi hemû şax û pêkahteyên xwe va! Û her ewê bikaribe bi têk'oşîna xwe ya ji bo aştîyê û dêmokrasîyê, ji bo ç'areserîya pirsgirêkan bingehekê bigihîne...

Û, dema mîmarê vê pêvajoyê – r'êberê gelê k'urd bir'êz Ocalan bang kirye, ewî baş dizanibûye, k'a yên ku li hember wî sekinîne, k'î ne. Wek ku dewlet PKK-ê baş nas dike, ji wê zêdetir jî R'êber Apo û PKK vê r'êjîmê nas dikin!

Lewra jî divê gelê k'urd û civak cîhanî t'u carê hêvî nekin, ku ev r'êjîm dê hema wisa hêsa r'ojekê ji bo sûcên xwe li xwe mukur' bê û gavên ç'reserîyê biavêje!

Ev xiyal e!

Û li vira dibe ku hinek bipirsin – wê demê çi dimîe?

Û ji bo vê jî dîsa bersîv li bal bir'êz Ocalan heye.

Bala xwe bidinê, ew di p'eyama xwe ya bi boneya 1-ê r'ezberê – R'oja aştîyê ya cîhanê da çawa careke dinê balê dik'işîne ser girîngîya vê pêvajoyê û destnîşan dike:

*"Banga me ya ji bo aştîyê û ç'areserîya demokratîk, ne gaveke siyasî ya jir'êzê ye, ew gaveke stratejîk e û pêvajoyeke dîrokî ye. Bi vê bangê r'a hem li T'irkiyeyê hem jî li seranserê R'ojhilata Navîn li ser bingeha aştîyê ji bo jiyaneke demokratîk deriyên serdemeke nû hatine vekirin. Û ev serdem dê şûna serdema şer' û wêraniyan bigire.*

*Ev, ne t'enê daxwazek e, – R'êber Apo didomîne, – ev r'astiyeke şênber e, a ku divê bi derfetên xurt û gavên praktîkî yên ciddî were avakirin. Ji ber ku aştiyeke r'asteqîn ne t'enê bêdengbûna ç'ekan, an jî bidawîbûna p'evçûnan e. Aştiya r'asteqîn, wê demê pêkan e, dema azadî, demokrasî û dadwerîya civakî di hemû warên jiyanê da pêk tên.*

*Veguher'îna civakî ji bo gelên me ne t'enê mafek e, ew di heman demê de p'eywira sereke ya serdema nû ya pêşer'ojê ye.*

*Aştî, demokrasî û nirxên azadiyê dê teqez bi têkoşîna gelên me r'a mayinde bibin û di nava jiyana civakî da cîhê xwe bigirin. Ev welat êdî dê bibe welatê wan kesan, ên ku aştî û jiyana demokratîk hem wek mafê xwe dibînin, hem jî wek p'eywira xwe..."*[2] – Û di dawîyê da bir'êz Ocalan bawerdarîya xwe dîyar dike, ku her kes dê ciddîyeta vê serdemê têbigihîje, xwe li ber ç'avan r'a derbas bike, li gorî r'uhê aştîyê t'evbigere, û bang dike, ku gel xwedî li vê p'eywira dîrokî derk'eve û meşa aştî û azadiyê mezintir bike.

Ango, naha dem pêr'a gihîştye, ku gel erk'a xwe ya sereke pêk bîne, xwedî li vê pêvajoyê derk'eve, di hemû warên jîyanê da bi t'evger doza mafên xwe bike, bi aktîvî beşdarî çalakîyên dêmokratîk bibe, bi xwe r'a wisa jî nûnerên dinê yên civaka T'irkîyayê hişyar bike û r'ayedarên r'êjîmê neç'ar bike, ku di vî warî da gavên şênber biavêjin...

Divê bê zanîn, her çiqas r'êjîm her tiştî dike, ku ev pêvajo têk her'e, lê, berovajî hewl û daxwezên wê, pêvajo r'ê li pêşîya derk'etina gelek r'astîyan vedike.

Û encamên wê jî li ber ç'avan in!

Bala xwe bidinê:

– Erdoxan li xwe mukur' tê, ku di welatê wan da dewletê li hember gelê k'urd *"şaşîyên sîyasî"* (bixwîne: *sûc!*) pêkanîne. Û wan *"şaşîyan"* ew weha r'êz dike: *kuştin û bê şop windakirina k'urdan ji hêla dewletê va, yên ku kiryarên wan hê jî nehatine diyarkirin, bûyerên ku di zîndana Dîyarbek'irê da pêkhatine, gundên ku ji hêla dewletê va hatine*

---

[2] https://kurmanci.anf-news.com/rojane/reber-apo-veguherina-civaki-peywira-sereke-ya-serdema-nu-ye-201109

*şewitandin, mirovên ku di nava şevekê da hatine k'oçberkirin, dayîkên ku nikaribûne di girtîgehan da li gel zar'okên xwe bi k'urdî biaxivin!*

Ew wisa jî li xwe mukur' tê, ku *ji sala 1984-an û vir va her hukumetek a T'irkîyayê hatye û gotye – emê PKK têk bibin, – lê ji wan r'a li hev nehatye, û ew çûne...*

Ku *wan di nava 40 salên derbasbûyî da dît, k'a çiqasî zehmet e, ku bi destûra bingehîn a darbek'aran civak bibe yek ...* Ku *T'irkiye êdî bi destûra bingehîn a darbek'aran nikare ber bi siber'ojê ve bimeşe. Êdî pêwîstî bi destûreke bingehîn a sivîlan heye, ne ya darbek'aran".*[3]

Û bûyerek a dîrokî:

– Dayîkên aştîyê di *"Komîsyona Dêmokrasîyê, xwîşk û biratîyê û yekîtîya millî"* ya Meclîsa T'irkîyaê ya da li ser mafên gelê k'urd axivîn. Û ev di dîroka T'irkîyayê da bûyerek a nebînayî bû. Û, her çiqas, serokê meclîsê Nûman Kûrtûlmûş destûr neda, ku dayîkên k'urd bi k'urdî biaxivin[4], dîsa jî, ev bi serê xwe bûyerek a dîrokî ye!

Çima?

R'ast hatye gotin, ku *encameke neyînî jî encamek e*!

Ev bûyera bi awayekî fermî bû belge û t'evahîya r'eng û r'ûç'ikê dijmirovî yê vê dewleta bi navê *"K'omara T'irkîyayê"* ya bi sûnî sazkirî nîşanî cîhanê da!

Ev dewlet, wek sîstêm, projeyek a hêzên mêtînger ên cîhanê bûye! Gelo ev hêzana têdigihjin, k'a hov û dir'indyek a çawa (canavar) hinartine û berî bedena mirovahîyê dane?!...

Balk'êş e, piştî van r'astîyan, di cîhanê da helwesta hevk'ar û hevalbendên vê dewleta sûck'ar, sazî û r'êxistinên navnet'ewî, yên wek R'êxistna Net'ewên Yekbûyî, Yekîtîya Ewropayê û yên dinê, dê çawa be?

Helbet, ev pirsek a hr'êtorîk e, û bersîva wê di wê bi xwe da heye!

Mirov li vira her dikare tiştekî bibêje: *"Eger wan r'êxistinan erk'ên xwe yên r'ewa pêk anîbûna, di vê cîhanê da dê ewqas bêdadî, t'evkujî, p'enaberî, wêranî û t'alan nînbûna!"*

Lewra jî, di vê r'ewşê da her gelê k'urd bi xwe dê bikaribe, bi xurtkirina yekîtîya xwe a net'ewî, bi hemû civak, sazî, r'êxistin û t'evgerên xwe va bi ahengî û hevdengî t'evbiger'e û doza mafên xwe yên mirovî û net'ewî bike. Şer'ê ç'ekdarî, yê ku li dijî têr'ora dewletê ya K'T' hatye meşandin, îro êdî bingehek ava kirye, ku gelê me bikaribe bi r'ê û r'êbazên aştyane û dêmokratîk doza mafên xwe bike.

Lê ji bo wê, ji bo ku ev pêvajoya, bi mîsîona xwe ya dîrokî va, heya dawîyê her'e sêrî, divê hemû sazî û r'êxistnên gelê me yên siyasî, r'ewşenbîrî, civakî, çand û hunerî, yên çapemenîyê û medyayî li vê pêvajoyê xwedî derk'evin...

Îro gelek r'ewşenbîr, zanîyar, nivîsk'ar û siyasetmederên navdar ên Cîhanê, di nava wan da wisa jî r'êzek xelatgirên Nobêlê (88 kes!), ji bo piştgirîya vê pêvajoyê û mîmarê wê – r'êberê gelê k'urd bir'êz Ocalan dengê xwe bilind dikin, û ev înîtsîtîva navnet'ewî divê ji hêla me – k'urdan va jî bê xurtkirin!

Gelek ji wan, ên ku di dema xwe da ç'ek hildane û li dijî vê bêdadîya dîrokî r'awestyane, bi lehengî p'akrewan bûne (em serê xwe li ber bîranîna wan diç'emînin!), ewana bingehek avakirine, ku gelê me îro bikaribe ji bo destanîna mafên xwe bi wêrekî t'evbigere. Û misogerîya pêkhatina hemû hêvî û daxwezên gelê me yên mirovî-net'ewî hema di vê da ye!

Ev pêvajo, ya ku di Bakûrê K'urdistanê û T'irkîyayê da destpêbûye, bandora xwe li ser hersê beşên dinê yên Welêt jî dike, lewra ku, her çiqas gelê k'urd ji hêla hêzên mêtînger ên navnet'ewî va di nava çar dewletan da hatye dabeşkirin, ew di bingeha xwe da yek net'ew û yek beden e! Û dema beşekî wê bedenê li cîyakî tê êşandin, ew êş derbazî beşên dinê jî

[3] Bi hûrbînî – di gotara "Erdogan: Bi vê destûra bingehîn Tirkiye nikare ber bi siberojê ve bimeşe" – https://kurmanci.anf-news.com/rojane/erdogan-bi-ve-destura-bingehin-tirkiye-nikare-ber-bi-siberoje-ve-bimese-197797

[4] Bi hûrbînî di vê derbarê da – di gotara "Kurdî li Enqereyê qedexe ye" da – https://infowe lat.com/kurdi-li-enqereye-qedexe-ye.html

dibe. Û evê yekê dewletên mêtînger jî dizanin, lewra jî, dema liv û t'evgerek di beşekî K'urdistana çarparç'ekirî da pêk tê, ew tirs û xofekê dike dilê dagerkerên beşên dinê. Dagerker jî me yek dibînin û p'ir'ji vê yekîtîyê ditirsin. Û evê r'ewşê di dîrokê da her carê xwe daye xuyan...

Û vê carê jî wisa ye!

Her çiqas, piştî banga bir'êz Ocalan PKK kongrêya xwe ya XII pêk anî, xwe wek r'êxistin betal kir, ji bo ev pêvajo her'e sêrî, agirbest daxwîyand, k'omek Gêrîlayên Azadîyê, wek helwesta aştîxwazîyê, ç'ekên xwe jî şewitandin, lê r'êjîma AKP/MHP ne ku t'enê gavekê naavêje, her weha daxweza ç'ekberdana hêzên R'ojavayê Kurdistanê – yên YPG/YPJ jî dike, gefan li R'êvebirîya X'weser a Rojava // Bakûr-R'ojhilatê Sûrîyayê dixwe.

Van demên dawîyê Dewlet Baxçelî, yê ku bang kiribû, ku bila Ocalan bê di Meclîsa T'irkîyayê da biaxive, û soza mafê hêvîyê dabû, lê bi xwe jî soza xwe pêkneanîbû, naha jî berê xwe daye R'ojavayê K'urdistanê û doza ç'ekberdanê ji YPG/YPJ dike, behsa întêgreya hêzên wan a di nava artêşa Sûrîyayê da dike... Her çiqas ne r'êvebirîyek a r'ewa di Şamê da heye, ne jî art'êşek, ên ku nûnerîya gelê Sûrîyayê bikin!

Mirov nikare tê bigihîje: evan mirovana heşê xwe xwarine, an hemû sînorên xwe yên mirovî, wijdanî û exlaqî binp'êkirine, û di xewê da an hişyar xwener'ojkên dema osmanîyan dibînin?!

Lêbelê, ew divê baş bizanibin, r'ast e, PKK, wek r'êxistin, xwe betal kirye, lê gelê k'urd û r'uhê ku PKK afirandye li holê ne, R'êvebirîya T'evgera R'izgarîxawaz a Net'wî li holê ye. Û ev ji her r'êxistinekê mezintir û hêztir e, û ya ku r'êxistinên wek PKK saz dike jî, hema ev e!

Nûnerên r'êvebirîya t'evgerê dem bi dem r'êjîm hişyar kirine, ku bi vî awahî nebe. Ku ji bo ku ev pêvajo her'e sêrî, şer'ê ç'ekdarî bê r'awestandin (ne ku *ç'ek bên danîn*, wek ku ew dibêjin!), divê r'êjîm sozên xwe pêk bîne, divê di sêrî da mîmarê wê – r'êberê gelê k'urd bir'êz Ocalan azad be, p'êwendîyên wî bi cîhanê r'a hebin, ew bi xwe hemû r'êvebirîya pêvajoyan bi praktîkî pêk bîne.

Ev mercê serke yê T'evgerê, yê gelê k'urd û hêzên aştîxwaz û dêmokratîxwaz ên cîhanî ye!

Divê ev r'êjîm xwe bi xiyalan t'êr neke! Hema di destpêkê da di bamga R'êber Apo da ji bo wan hişyrîyek hebû. An wana ew baş nexwendine, an jî xwendine, lê didin xuyan, ku têncgihîştine!

Lewra jî, em neç'ar in, her carê, bê westan û r'awestan hem ji bo r'ayedarên r'êjîmê û derdorên wê, hem jî ji bo hinekên di nava me da dubare bikin, ku ew van gotinên p'eyama R'êber Apo ji nûva bi baldarî bixwînin û baş bidin heşê xwe:

*"...R'êzgirtina nasnameyan, azadîya r'amanê, r'êxistinbûna dêmokratîk, avakirina civakî, aborî û siyasî ya hemû pêkhateyan t'enê bi hebûna civak û qada siyasî ya dêmokratîk dikare hebe.* ***Sedsala k'omarê ya duyemîn t'enê, dema ku bi dêmokrasî bê t'acîdarkirin, dikare bibe xwedî yekîtî û berdewamîyeke mayînde.*** (Bi t'aybet bala xwe bidin ser vê hevokê! – E. C.). *Ji dêmokrasîyê pêva t'u r'eyeke dinê ya lêger'îna p'ergalan û pêkanîna wan nîne, ne mumk'ên e..."*[5] – Û ev jî hema lêytmotîva vê pêvajoyê ye, ya ku bir'êz Ocalan di banga xwe ya destpêkê da destnîşan kirye. Û bersîva hemû pirsan li vira heye. Her pirs di wê da ye, k'a k'î wê çawa dixîne û çiqasî têdigihîje!

Ev tê çi wat'eyê?

Ango, dewlet bi xwe jî divê bê guhar'tin, ew divê dêmokratîk bibe. Divê K'omar bibe dewleta hemû pêkhateyan, û mafên hemû gelan li ser bingeha wekhevîyê bi destûrî bê misogerkirin. Divê ewlehîya her kesekî, k'omekê, civakekê, gelekî bi destûrî bê misogerkirin. Divê wisa jî, bi destûrî ç'ek û hemû sazî û p'ergalên cezak'ar (*repressive*) di bin kontrola gel da bin, ji bo ku hîç sewdaserekî wek evên îroyîn nikaribe, art'êşê li dijî gelê

[5] https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R_OJEVA_K_URDÎ_YA_CÎHANÊ_PÊVAJOYA_AŞTÎYÊ_Û_PÊŞK_E VTINÊN_SÛRÎYAYÊ

medenî k’ar bîne, gund û bajarên wan wêran bike, t’evkujîyan pêk bîne, bê ser û ber siaysetmeder û çalakvanên civakî bigire û bavêje hebsan (îro di girtîgehên K’T’ da derdorê 15 hezar girtîyên k’urd ên siyasî hene!), ji bo ku hîç sazîyek a dewletê, an r’ayedarek (ew k’î dibe, bila bibe!) nikaribe dest dayne ser şaredarîyan, û r’êvebirên wan, ên ku bi dengê gel hatine hilbijartin, bavêje hebsan û li şûna wan mirovên xwe p’eywirdar bike...

Ev tê wê wat’eyê, eger ev hemû pêk bê, dê r’êyên ç’areserîya hemû pirsgirêkan vebin, gel dê bi xwe ç’arenûsa xwe hilde destê xwe!... Lê, eger na, wê demê kesek nikare garantîyê bide, ku ***k’omarê bikaribe di sedsala xwe ya duyemîn da bibe xwedî yekîtî û berdewamîyeke mayînde!*** – Eger mirov vê bi zimanê gelêrî bibêje, wê derê: *eger k’omar (T’irkîya) xwe neguhêr’e, ewê nikaribe hebûna xwe wisa yekgirtî bidomîne!* Ev – ji bo têgihîştina giştî!

Em bi bawer in, ku Erdoxan û Baxçelî evê yekê baş têgihîştine, her pirs di wê da ye, k’a ewê k’îjan r’êyê hilbijêrin: r’êya dêmokratîkbûnê, û bi wê welatê xwe ji hilweşînê bip’arêzin, an a xwekujîyê, û bi xwe jî bibin tevirk’olên[6] vê dewleta zulmê û li ser k’ilafeyên wê r’ûnîn, bilûvînin û r’ondikan bibarînin...

Di axavtina xwe ya di derbarê destûra bingehîn a T’irkîyayê da Erdoxan her weha dibêje: *“T’irkiye tê guhar’tin, cîhan tê guhar’tin. Em di serdemeke nû da ne, em ber bi serdemeke nû va diçin”.*[7] – Mirov ji van gotinên wî bawer bike?

Dema mirov li serdema piştî banga bir’êz Ocalan û vê pêvajoyê dinihêr’e, dibîne, ku bi r’astî jî, di K’T’ da guhar’tin pêk tên, lê ew nayên hesabên r’êjîmê, lewra jî ew ji van guhar’tinan ditirse, ji wan r’a dibe asteng û çi ku ji destê wê tê, dike, ku pêvajo têk her’e. Lêbelê, di xwemukur’hatinên Erdoxan da, ên ku li jorê behsa wan hat kirin (li r’ûp’elên 3 û 4-an ên vê gotarê binihêr’in!), tê xuyan, ku ew (wek kes, an wek serokk’omar – zêde ne girîng e!) gelek pirsan tê digihîje û wê têgihîştina xwe tîne zimên. Û, dema mirov bi heşmendî lê dinihêr’e, ewî divê her tişt bikira (wek serokk’omar!), ku r’ê li pêşîya vê pêvajoya guhar’tin û veguhar’tinan bihata vekirin, û ew bê astengî bi encam bibûya.

Û lewra jî, dê wisa jî bi heşmendî bûya, eger wana mîmarê vê pêvajoyê – bir’êz Ocalan vexwendana, bi wî r’a bik’etana nava dîalogê (lewra ku, yê ku bersivên hemû pirs û pirsgirêkan dizane, ew bi xwe ye!), û bi hev r’a r’êyên ç’areserîya pirsgirêkên heyî biger’yana û bidîtana – hema, eger ne ji bo xatirê gelê bindest û zêryayî be jî, hîç nebe, ji bo xatirê K’omarê, ya ku ew, xwedêgiravî, ewqas jê hezdikin – ji bo ku ew ji felak’etên nû r’a r’ûbir’û nemîne…

Ev nak’okî ji k’u tê û mirov dikare wê çawa têbigihîje?

Bi r’astî jî, hinek tişt hene, ku di goveka têgihîştina mirovê normal da cîh nabin!

Lê, her çi jî hebe, r’astîyek li holê ye: helwest û hewlên r’êjîmê çawa dibin, bila bibin, pêvajoya aştîyê û civaka dêmokratîk ne ku t’enê êdî bûye p’arçeyekî jîyana Bakûrê K’urdistanê û T’irkîyayê, lê wisa jî gelek r’astîyên dîrokî derxistine holê û di herêma R’ojhilata Navîn û Cîhanê da jî dengvedaye.

Evê pêvajoyê êdî pêr’a gîhandye, di nava têgîhîştin û helwestên di gelek waran da guhar’tinan pêk bîne: em hema xwemukur’hatina Erdoxan, govtûgo û gengeşîyên piştî wê, dema serokê Meclîsa T’irkîyayê Nûman Kûrtûlmûş destûr neda Dayîkên Aştîyê, ku ew bi k’urdî biaxivin, her weha axavtinên serokên berê yên Meclîsa T’irkîyayê bînin bîra xwe, ên ku di civînên *Komîsîona dêmokrasîyê, xwîşktî-biratîyê û hevgirtina millî* da pêk hatibûn! …

Pêvajo didome, û ç’avê gelê k’urd, dêmokrat û aştîxwazên T’irkîyayê û cîhanê lê ye, ku r’êjîma K’T’ li ser r’êya pêkhatina aştîyê û civaka dêmokratîk gavên şênber biavêje…

## Naha jî – di derbarê r’ewşa R’êvebirîya Xweser a Bakûr-R’ojhilatê Sûrîyayê (R’ojava) û R’êvebirîya demguhêr’ a Şamê da!

Bi r’astî, dema têgînên *'R’êvebirîya Xweser a Bakûr-R’ojhilatê Sûrîyayê'* û *'Rêvebirîya*

---

[6] Tevirk’ol – gor’kenî, yê/yên gor’an dik’olin.

[7] https://kurmanci.anf-news.com/rojane/erdogan-bi-ve-destura-bingehin-tirkiye-nikare-ber-bi-siberoje-ve-bimese-197797

*demguhêr' a Şamê'* tînin r'ex hev û di nav çarç'oveyekê da dinirxînin, mirov matma dibe, nak'eve heşê mirov – çawa dibe, li ser çi bingehê?

Bakûr-R'ojhilatê Sûrîyayê, bi hemû sazî, dezgeh û r'êvebirîya xwe va, bi hêzên xwe yên p'arastinê (HSD) va, êdî sêzdeh sal in, di encama têk'oşînek a bêhemp'a ya dijî DAÎŞ-ê da pêk hatye û heye. Û wê demê, dema hê r'êjîma baasî li ser desthilatê bû, pêkhateyên vê herêmê li dora hêzên R'ojavayê K'urdistanê (YPG/YPJ) bûne yek, navçeyên xwe ji DAÎŞ-ê r'izgar kirine, hêzên xwep'arastinê saz kirine (HSD) û li ser bingeha dêmokrasîyê û wekhevîyê ji bo herêmê r'êvebirîyek ava kirine. Û ev sazî, wek mînakek a nimûneyî li ser asta navnet'ewî hatye naskirin. Yên ku di sazî û dezgehên r'êvebirîyê da cîhê xwe girtine, hemû jî nûnerên pêkhateyên herêmê ne, ew ji hêla gelê herêmê va hatine hilbijartin. Yên ku di nava hêzên p'arastinê (HSD) da cîhê xwe girtine jî, dot û lawên vî gelî ne.

Ev herêma xweser bi sazî, dezgeh û r'êxistinên xwe va êdî wek dewletek a bi r'êk û pêk t'evdiger'e, û bi xwe dikare bibe bingeha dewletek a bi hêz û aram. Ango, ew dikare ji bo Sûrîya pêşer'ojê bibe bingeh, û avakirina pêşer'oja wê jî dikare ji vir destpê bibe, ne ji Şamê, li k'u çend k'omikên ç'ekdar ên îslama t'undûraw (ên ku p'ir'anîya wan ne sûrîyayî ne!) di qesra Beşar Esed da berev bûne û xwe desthilat r'agîhandine…

Lewra jî, dema di derbarê întêgrebûna r'êvebirîya herêmê di nava ya Şamê da tê axavtin, mirov matma dibe: çawa dikare herêmek a xweser a ku wek dewletekê êdî jizûva bi hemû sazî û dezgehên xwe va pêk hatye, întêgireyî cîyekî bibe, li k'u hîç tiştek bi t'u awayekî pêk nehatye û r'êvebirîya wê jî, ya ku demguhêr' tê navkirin, ji k'omikên ç'ekdar ên DAÎŞ-ê û r'êxistinên dinê yên îslama r'adîkal pêk tê, yên ku bi p'ir'anîya xwe ne sûrîyayî ne? …

Û li vira pirs di wê da ye, k'a ev k'omikana, bi bîrdozîya DAŞ-ê, r'êgezê şerîetê û r'adîkalîzmê dê di Sûrîyayê da sîstêmê ava bikin? – Soz û gotin tiştek in, lê heşmendî, têgihîştina cîhanê û nirxên mirovahîyê tiştekî dinê ne! Û evê yekî jî ew nikarin ji çavê cîhanê veşêrin.

Wek ku Ajansa Nûçeyan a Firatê r'adigihîne, r'ojnameya amêrîkî Nyû York' T'aymzê (The New York Times) di hejmara xwe ya 8-ê r'ezbera sala 2025-an da nivîsye, ku piştî hilweşîna r'ejîma Esad (dawîya sala 2024-an, Ahmed eş-Şaraa (Ebû Mûhmmed el Colanî), dema hatye ser desthilatê, sozên r'êforman daye, lê hîn jî di Sûriyeyê da otorîterî didome, û bi hûrbînî vê r'ewşê mak dike.[8]

Ev – ji bo têgihîştineke giştî!

Demekê berê me ji bo ç'areserîya vê r'ewşê dîtinên xwe anîbûn zimên û r'êyên heşmendî yên r'êal pêşniyar kiribûn, û, wek ku tê xuyan, ew pêşniyar îro jî guncan e.

Di wê pêşnîyarê da dihat gotin, ku di vê r'ewşê da, bi t'aybet jî piştî t'evkujîyên elewîyan û durzîyan, dê r'ast bibûya, eger hêzên navnet'weî, di bin ç'avdêrîya R'êxistina Net'ewên Yekbûyî da r'êvebirîyeke demkî (an jî koordînatsîonek!) a navnet'ewî ava bikirana, ya ku ji nûnerên hemû pêkhateyên Sûrîyayê Komîsîona Destûra bingehîm sazbikira, ya ku li ser pêşnîyarên pêkhate û herêmên cuda ji bo vî welatî Destûrek amade bikira, û ew bi r'êya r'êfêrêndûmê (dengdana giştî) bihata p'ejirandan – wek ku ew di welatên şaristanî da pêk tê! Her piştî vê, dema Destûra bingehîn, wek peymana di navbera welatîyan da, bê p'ejirandin, ewana dikaribûn di demek a diyar da amadek'arîyên hilbijartinên herêmî pêkbînin (ji gund û t'axan heya her'e-bigihîje bajar û herêman), piştr'a jî evana dikaribûn nûnerên xwe ji bo Parlamêntoya Sûrîyayê û piştr'a jî serokk'omarekî û hukumetê hilbijêrin...

Her bi vî awahî dikaribû r'êvebirîyek a r'ewa ji bo Sûrîyayê pêk bihata, ne ku bi destê k'omên ç'erdevanên navnet'ewî yên îslama r'adîkal, ên ku t'u têk'ilîya xwe bi Sûrîyayê r'a nînin, ji bilî wê, ku ewana t'evkujîya hemwelatîyên wê pêkanîne û îro jî didomînin.

---

[8] Hûrbînîya wê li vira ye: https://kurmanci.anf-news.com/rojava-sUriye/new-york-times-li-gel-sozen-reforme-ji-li-suriyeye-otoriteri-dewam-dike-201388

Û her piştî vê, dema gelê R'ojava û Bakûr-R'ojhilatê Sûrîyayê jî, bi hemû pêkhateyên Sûrîyayê r'a t'evayî, nûnerên xwe bişîne Parlamêntoyê, û ew li wira (dîsa bi hev r'a!) Destûra a bingehîn p'esend bikin, a ku bibe misogerîya (garantî) mafên xweserîya R'ojava (Bakûr-Rojhilatê Sûrîyê), herêmên elewîyan, durzîyan û hemû sûrîyayîyên dinê...

Û ev hemû, ne ku divê bi destê k'omek a cerdevanên biyanî pêk bê, lê bi r'ayê welatîyên Sûrîyayê bi xwe, bi vîna wan a azad, bi r'êyên aştî û dêmokrasîyê.

Ev êdî derdorê çardeh salan e, ku li R'ojava sîstêmek a şaristanî û r'êvêbirîyek a dêmokratîk a xweser hatye avakirin, a ku dikare bibe mînak ne ku t'enê ji bo K'omara Sûrîyaê ya pêşer'ojê, lê, her weha, ji bo t'avahîya herêma R'ojhilata Navîn.

Di nava gel da hêvî û bawerîyek a mezin li hember R'êvebirîya Xweser gihîştye, ku di her r'ewş û mercan da ewê ji bo ç'areserîya pirsgirêkan r'êyên here r'ast bibîne û bi mînaka xwe û bi beşdarîya xwe ya aktîv r'ê li pçîya aştî û dêmokrasîyê veke!...

Lêbelê, mixabin, an ji talebextan r'a, dengek, an liv û t'evgerek ji sûrîyayîyan bi xwe dernayê, û ev jî, di derbarê welatekî an net'eweke "yekgirtî" da gelek tiştan dibêje!...[9]

Sûrîya îro li ser dur'êyana dîrokê sekinye. An gelê wê dê bi hemû pêkhateyên xwe va di nava xwe da hêz û bir'yardarîyekê bibîne û bikaribe bi aktîvî beşdarî veguhar'tina welatê xwe bibe, an jî dê ç'arenûsa xwe bi destê k'omikên cerdevanên îslama t'undûr'aw va berde û bibe sedema (an gunehk'arê?!) p'arçebûna welatê xwe yê demekê...

Û di vê r'ewşê da ev êrîş û fişarên r'êjîna T'irkîyayê ên li ser R'ojava, helwesta hêzên hevpeymanî û, bi t'aybet jî, ya nûnerê DYA yê ji bo pirsên Sûrîyayê T'om Barrak û pêşnîyarên wî ji bo sazkirina herêmek a tampon da di nava gel da bûye sedema tirs û fikaran. Lewra ku ev herêma tampon, a ku nûnerê DYA pêşnîyar dike, plana T'irkîyayê ye, ya ku tê wat'eya r'adestkirina xakên Herêma Xweser, ji bo ku r'êjîma KT a dagerker bikaribe hemû destkevtîyên gelê herêmê t'une bike. Ev bazarî ye, an sênarîoyek e, ya ku ji hêla mirovekî xişîm û nedestûrmend va bi amatorî hatye r'êjîkirin?! – Dibe ku herdu t'eref jî di nava hev da û bi hev r'a dertên pêş!

Dibe ku hinek bipirsin, k'a Erdoxan çima wisa bi biryar Sûrîya kirye armanc?

Helbet, li vira xewnerojkên wî yên di derbarê Împêratorîya Osmanîyê da rola xwe dilîzin.

Lêbelê, li vir pirsên têk'ilîyên di navbera DAŞ-ê û Erdoxan da r'oleke sereke dilîzin. Ew têk'ilî li ser asta navdewletî baş tên zanîn: di nava vê r'êxistinê da Erdoxan wek emîrê xwe yê ne formal nas dikin – piştî El-Bexdadî; û ewî girêdana xwe bi wê r'êxistinê r'a di praktîkê da daye xuyan û piştr'ast kirye – eger delîêlek a dinê nînbûya jî, Doza Kobanîyê bes bû!...

Û naha jî ew her tiştî dike, ku di Sûrîyayê da li daîşîyên xwe xwedî derk'eve.

Lê, ji bilî vê û ji vê jî zêdetir, mezintirîn tirsa wî û r'êjîma wî ew e, eger di Sûrîyayê da k'urd bibin xwedî statûs, dê pêwîstîya statûseke wisa di T'irkîyayê da jî derê, ya ku dikare bibe sedema guhar'tina sîstêama dijmirovî di T'irkîyayê da. Lewra jî – ev desttêwerdan, ev fişar û êrîşên ser R'ojava ji hêla wan va!

Û ev hemû anegorî r'êgez, heşmendî û têgihîştina r'êjîma faşîst e!

Lêbelê, li vira paradok's di wê da ye, ku ew bi xwe ji bo wan sûcan, ên ku dewletê li hember gelê k'urd pêkanîne, xwemukur' tê, bi xwe di derbarê dijmirovîbûna wê sîstêmê, destûra wê ya bingehîn da dibêje û bi xwe jî ewê *destûra derbekaran* navdike![10] ...

Çawa dibe?!

Her çi jî hebe, T'evgera K'urdî vî mirovî û r'êjîma wî baş nas dike!

Lê li vira ya ku nayê têgihîştin, helwesta DYA-yê ye.

Ji hêlekê va şandên wan ên li ser asta here bilind tên herêmê û bi gênêral Mazlûm Ebdû û nûnerên r'êvebirîya xweser r'a hevdîtinan pêk tînin, hêzên wan ên leşkerî bi yên HSD r'a

---

[9] Bi hûrbînî li vir bixwînin: https://www.amidakurd.net/ku/tekst/P%C3%8AVAJOYA _A%C5%9ET%C3% 8EY%C3% 8A_%C3%9B_CIVAKA_D%C3%8AMIKRAT%C3%8EK

[10] Fermo, careke dinê li r'ûp'elên 3 – 4-em ên vê gotarê binihêr'in!

werzêşên leşkerî (tatbîkatan) bi beşdarîya balafir'ên leşkerî (cara yekem!) pêk tînin, fermandarê Hêzên Navendî (CENTCOM) ên DYA-yê Brêd Kûpêr dema seredana xwe ya Bakur û R'ojhilatê Sûriyeyê bi fermandarê giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) Mazlûm Ebdî r'a hevdîtianan pêk tîne[11], lê ji hêla dinê va ew daxwîyanîyên T'om Barrak dertên pêş û wisa jî agahîyek di wê derbarê da dertê, ku, eger êrîşek li ser R'ojava pêk bê, DYA-ê wek ku Îsaraîlê durzî p'arastine, wan nep'arêzin...

Ê, wê demê hevpeymanîya têk'oşîna li dijî DAÎŞ-ê li k'u ma? – Ma ne, êrîşê Erdoxan tên wat'eya êrîşê DAÎŞ-ê!

Helbet mirov dikare heya r'adeyekê têbigihîje (her heya r'adeyek!) T'irkîya endamek a NATO-yê ye, û di heman demê da hevk'ar a DAÎŞ-ê ye jî! Wê demê çi dertê holê? DYA bi r'êya hevk'arên DAÎŞ-ê (Erdoxan û klîka wî!) planên xwe yên ji bo R'ojhilata Navîn pêk tîne? – Dikare? Ji ber ku bîznêsa here mezin şer' e?

Vê demê mirov di vê r'ewşê da yekawa jî nizane çi bibêje!

Lêbelê ji hêla dinê va, mirov dikare spasîya xwe dîyarî wan bike, ji ber ku ç'avên me li ser hinek r'astîyan vedikin?!

... Û, eger sibê êrîşek bê ser R'ojava, ew êrîş dê li ser hemû nirx û hêjayîyên gelê k'urd be. Wek ku bir'êz Ocalan gotye – R'ojava xeta me ya sor e! – Xeta net'ewî!

Evê xetê jî divê em bi net'ewî bip'arêzin!

Û ew p'arastin jî t'enê nayê wat'eya p'arastina bi hêza ç'ekdarî, divê her weha hemû r'ê û r'êbazên aştî û dêmokrasî jî bên k'aranîn: *ew têk'ilîyên siaysî ne, çalakîyên dêmokratîk in, dîplomasîya gel e, çapemenî û têlêvîzîon e, medya civakî ye, sîmpzîûm in konfêrans in!* ... Ji bilî vê, divê bê zanîn, îro gelê me di cîhanê da t'enê nîne, di gelek welatan da k'omele û r'êxistinên me hene, di wan welatan da bi beşdarîya nûnerên gelên binecî dikarin K'omele an Komîtêyên piştgirîya R'ojava bên damezirandin...

R'ê û r'êbaz p'ir' in, kî bi çi awahî dikare, divê beşdarî wan çalakîyan be!

**11. 09. 2025.** **Pyatîgorsk/Rûsîya**

**Her weha çend gotarên dinê jî – bi vê mijarê:**

"R'ewşa Sûrîyayê piştî têkçûna r'êjîma baasî, pirsgirêka k'urdî r'êyên ç'areserîya wê!" – https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R_EWŞ A_SÛRÎYAYÊ_PIŞTÎ_TÊK ÇÛNA_R_Ê JÎMA_BAASÎ_PIRSGIRÊKA_K_URDÎ_Û_R_ÊYÊN _Ç_ARESERÎYA_WÊ

"R'ojeva k'urdî ya cîhanê, pêvajoya aştîyê û pêşk'evtinên Sûrîyayê!" – https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R_OJEVA_K_URDÎ_YA_CÎHANÊ_PÊVAJOYA_AŞTÎYÊ_Û_PÊŞK_EVTINÊN_SÛRÎYAYÊ

"Newroza azadîyê, pêvajoya aştîyê, astengî û xeterîyên li ser r'êya wê û çend têbînî" – https://www.amidakurd.net/ku/tekst/NEWROZA_AZADÎYÊ_PÊVAJOYA_AŞTÎYÊ_ASTENGÎ_Û_XETERÊN_LI_SER_R_ÊYA_WÊ_Û_ÇEND_TÊBÎNÎ

"Pêvajo û r'ojeva k'urdî – k'î wan çawa dibîne û têdigihîje!" – https://amidakurd.net/tools/saveFile/mod_makale/2301/32

"Pêvajoya aştîyê û civaka dêmokratîk, helwesta r'êjîma AKP/MHP û r'astîyên dîrokî!" – https://www.amidakurd.net/ku/tekst/P%C3%8AVAJOYA_A%C5%9ET%C3%8EY%C3%8A_%C3%9B_CIVAKA_D%C3%8AMIKRAT%C3%8EK

[11] https://kurmanci.anf-news.com/rojava-sUriye/mazlum-ebdi-bi-fermandare-centcom-e-re-civiya-we-pistgirya-ji-bo-qsd-e-dewam-bike-201257